JIN Û ZELAM, ZELAM Û JIN

Evîn Taha

Her kes dizane jin elementeka serekiye ya dewamkirina jiyanê. Di vê nivîsînê de em wê hewl bidin hinek ji wan teybetiyên jinan destnîşan bikin, yên ku li nik zelaman hinekê nahêne qebûlkirin. Belku zelam regezê xwe li hember wê weke çek bi kar dihîne.

Jin hez dikin li devê sûpermarketan bo demekê dirêj rabiwestin û tamê ji berê xwe dana wan tiştên li camxanan de werbigirin û gelek ji demê xwe bi belaşî pûç dikin, ya ji vê hin ji xirabtir her dem dixwazin zelamên wan pêrebin.

Jin li demê giftûgokirina her babetekê hestiyar, yan dema li beramber filîmekê xweş yan tiradejî rûdine xwarê, rondikên wê dihêne xwar û dixwaze zelamê wê jî hevparê hêsirên wê be, li demê zelam hevsoziya xwe bi wêre dernabire dibêje, ev me nagehin. Çi dîmen ji wî xirabtir nînin demê jinek li ber singê zelamê xwe rûdine bê ku çi gotinan bike û dest bide girî, her çende zelam bara pitir agehiya wan ji giriyê jinê heye lê heger dîsan jin bi xwe bahs ji hokarên giryana xwe neke zelam nikare bi dirustî li ser egeran rabiweste.

Zelam heger bi nazikiya jinê razi jî bibe, lê pê xweş nabe ku rondikên wê bibîne yan her qebûl nake. Zelam amadeye li ser her babetekê jinê û pê xweşe bide û bistîne û hevparbe. Babetên ku jinê pê nexweşin dîsa zelam amadeye xwe bi xemên wê re bibîne.

Pitiriya jinan pê xweşe zelamên wan behsa ciwanî û rindiya wan bikin û her dem sexletên wan yên baş û ber çav dupat bikin. Jin tamê ji vî awayî derbirînê dibînin. Jin her hez dike heger yek jê re bibêje zelamê te gelek tu xweş divê û

zor pesna çakiyên te cem min kirine.

Jin her dem zelamên xwe wekû çavkanîkên evînê dihînin ziman bi qiseyên wan yên xweş dilrehet û aşna dibin. Lê zelamî jina rastgo bidile û ew bi xwe kesekê serhişke dikare li ser piyên xwe raweste û berdewam bernameyên xwe yên jiyanê jî hene.

Zelam hez nakin jin li hember wan dilpîsbin. Bo nimûne: heger zelamek behs ji ciwanî yan zîrekiya jinekê bike dê bînî jina wî tûre dibe û naxwaze guh li qiseyên wî bigire.

Zelaman pê nexweşe jinên wan her dem jê bipirsin: "tu hizra çi dikî?" nimûneyên vê cûre pirsê ku eve çendîn çerxe dihête dubarekirin, zelam hez jê nakin û weku kontorolkirina xwe lê dinêrin. Zelam wesa hizir dike heger jin ji hevbendî eşqa wî beramber xwe piştrastbe, pêdivî nake her dem pirsiyara dubare bike.

Zelam naxwazin jin dest di nehiniyên wan vedin, lê jin gelek hez dikin her dem bê eger, bê girûve, nehîniyên zelamê xwe aşkere bike. Pitiriya jinan dixwazin hemû kar û kiryarên zelamên xwe yên rojane bizanin û lê agehdar bibin ji bo vê meremê gelek caran sîxuran li ser datînin. Lê zelama dijayetiyeka pir mezin li gel vê yekê heye û bi tiştekê çepel lê dinêrin.

Zelam hez nakin jin li hember wan dilpîsbin. Bo nimûne: heger zelamek behs ji ciwanî yan zîrekiya jinekê bike dê bînî jina wî tûre dibe û naxwaze guh li qiseyên wî bigire. Zelam vê reftarê bi nezanîn dihînin ziman û jê hez nakin. Heger carekê bêdest nave jinekê ji devê zelamî derket, dûr nîne jin bi dehan hizrên şaş li mêjiyê xwe de bihîne û bibe û tûşî gumanê û têgehiştinên negativ bibe. Bo parastina xwe ji van serdeçûnên xwe yên zimanî, zelam neçar dibe ku derewa bike û rastiyan şêlû bike da ku jin dilpîs nebe li hemberî wî.

Bi giştî jin li hember dostayetî û wefadariya zelaman bi guman in, helbet ev yeka zelaman dilgiran dike û diêşîne.

Derbirîn û tekezkirina vê gotinê; "ez ji hemû jinan baştir û xwedî şiyantirim", zelaman dixîne di çarçûveyê gumanê de, li dawiyê dibêjin kula mezin li wê derê de ye ku her jinek xwe bi baştir, ciwantir, rastgotir û wefatirîn jin li cîhanê dibîne, lê amade nîne ku dan bi kêmasiyan bike û rastiyan aşkere bike.